



# THE MESSAGE OF THE CROSS

For Children & Youth

PEYAMA XAÇÊ JI BO ZAROKAN  
Û NÛCIWANAN

in English and Kurmanji

Bi înglîzî û kurdî

Maria T. Nagel

# The Message of The Cross for Children and Youth

## Kurmanji Kurdish

Copyright © 2019 by Maria T. Nagel.

All rights reserved. No portion of this book may be reproduced, stored in a retrieval system, or transmitted in any form or by any means, except for brief quotations in printed reviews, without prior permission from the author. Requests for information should be addressed to the author:

blessed-books@outlook.com  
www.iBless.it

Text and Illustrations by Maria T. Nagel.  
Book conception, design and creation by Maria T. Nagel.  
Self-published through Blurb, Inc. 2019

Editing by ChristianEditingServices.com.

Kurmanji translation by Amed Çeko Jiyan.

### DISCLAIMER

The featured images are artistic expressions of the illustrator and therefore not intended to be used as religious objects of worship or veneration.

### FERAXAT

Wêneyên hatine nîşandan, derbirînên hunerî yê xêrkarê ne, û loma jî nehatine armanckirin ku wekî amûrên îbadetî û dînî yê pîrozweriyan bîn bikaranîn.

The content of this book has been translated by a Farsi native expert translator. However, Kurmanji also called **Kurmanji Kurdish** is spoken in several countries such as Turkey, Syria, Iraq and Iran. Linguistic differences are therefore inevitable. Feel free to email us if you have any questions or concerns about this translation.

**blessed-books@outlook.com**



A very long time ago Father God was sitting on His throne in heaven with a concerned look on His face.

His only Son, Jesus, bowed before Him and asked,

"Father, what is the matter?" Father God answered,

"Oh, my beloved Son, my heart hurts whenever I look down from heaven and see the people on earth doing bad things."


Jesus nodded. "I know it brings you great pain, Father."

Beriya demeke gelekî dirêj, Xwedayê Bav li bihuştê bi awir û rûyekî xemgîn li ser textê xwe rûniştibû. Tekane Kurê wî Îsayî xwe bi hurmet tewand û pirsî,

"Bavo, çi bû?" Xwedayê Bav bersiv da,

"Ey Kurê min ê hezkirî, her cara ez ji bihuştê li xwarê dinêrim û dibînim mirov tiştên xirab dikin, dilê min diêşe."

Îsayî serê xwe hejand. "Ez dizanim ev te gelekî diêşîne, Bavo."



"Some of them believe I don't even exist."

A single tear trickled down Father God's cheek.

"It breaks my heart even more to know many of them will not come and live with me in heaven when their time on earth ends."

"The people on earth know what is good but always seem to choose what is bad," Jesus replied. "We have already sent so many messengers to talk to them."

"I know, my Son. Many of them love darkness more than light."

Father God brushed the tears from his eyes.

"Hin ji wan wisa bawer dikin ku ez tune me."

Dilopek rondik ket ser hinaroka rûyê Xwedayê Bav.

"Dilê min diêşe ku dizanim gelekên wan pişfî dema wan li ser rûyê erdê tamam bibe wê neyên bihuştê û li virê bi min re nejin."

Îsayî got, "Mirovên li ser rûyê erdê dizanin ka çi baş e lê wisa xuya ye ew her car tiştên xirab hildibijêrin" û dewam kir, "Me heta niha gelek peyamnêr şandine ku bi wan re biaxivin."

"Ez dizanim, Kurê min. Gelekên wan ji ronahiyê bêtir ji tariyê hez dikin."

Xwedayê Bav rondikên çavên xwe paqij kirin.



"Father, your prophets have told them how much you love them and that you can help them, no matter what problem they are facing."

Jesus thought for a moment in silence and then continued.

"They were also warned that bad behavior must be punished, but even with all this they refuse to change. What else can we do? "

"Bavo, pêxemberên te bo wan ragihandin ka tu çiqas ji wan hez dikî û ku tu dikarî alîkariya wan bikî, xem nake ka ew rastî çî arîşeyan tên."

Îsa kêliyekê bêdeng hizirî û paşê dewam kir.

"Ew hatibûn hişyarkirin ku kiryarên xirab dê bîn cezakirin, lê li gel van hemûyan wan xwe neguhert. Em dikarin wekî din çî bikin? "




"Should we send another messenger?" Jesus asked.


"I don't want to send messengers every year."

Father God held up one finger.

"I know exactly what to do."

"What will you do, Father?"





"Divê em pêxemberekî din bişînin?" Îsayî pirsî.

"Ez naxwazim her sal peyamnêran bişînim."

Xwedayê Bav tiliyeke xwe hilda.

"Ez dizanim ka ez ê çi bikim."

"Ma tu yê çi bikî, Bavo?"

"I will do something new. Instead of only saving a few, I will save all the nations of the world."

"How Father?" Jesus asked.

"I need someone who is willing to be punished for the sins of the entire world."

Jesus peered deeply into his Father's eyes.

"I think I understand your plan."

"It must be someone I deeply trust. Someone who is innocent and pure like a spotless lamb."



"Ez ê tiştêkî nû bikim. Ji dêvla tenê hinekan, ez ê hemû miletên cîhanê xelas bikim."

"Çawa Bavo?" Îsayî pirsî.

"Ji min re kesekî wisa divê ku ji ber gunehên hemû cîhanê bê cezakirin." Xwedê got.

Îsayî kûr li nav çavên Bavê xwe nihêrt. "Dibêjim qey ez plana te fêm dikim."

"Kesekî wisa ku min bawerî pir pê heye. Kesekî wekî berxeke bêguneh saf û pak."



"Father, send me."

Jesus knelt before His Father and pleaded,

"Let me be the Lamb who will take away their sins."

The sad look on God's face completely disappeared and was replaced by a smile.

"Oh, my Son, my heart is now rejoicing! I will send you. Whoever listens to you and repents of their sins, will be forgiven."

"Bavo, min bişîne."

Îsayî li ber Bavê xwe çok da û jê lava kir,

"Bihêle ez bibim berxê ku dê wan ji gunehan xelas bike."

Xemgîniya li ser rûyê Xwedê bi temamî çû û ciyê xwe da kenekê.

"Ha Kurê min, dilê min niha şad e! Ez ê te bişînim. Hemû kesên guh bidin te û ji gunehên xwe tobe bikin, dê bên efûkirin.



"And we will build them beautiful homes where they can live with us forever."

Jesus threw his arms around His Father's neck.

"Oh, Father, you are so good and make the unthinkable possible."

After a long hug, Father God said,

"Now listen, my Son. Because you will receive the punishment for the people of this generation and all the generations to come, the punishment will be very painful."

"Û em ê ji bo wan xaniyên xweşik ava bikin ku heta hetayê bi me re bijîn."

Îsa milên xwe li stûyê Bavê xwe gerandin.

"Ha Bavo, tu gelekê baş î û tu tiştê nayê bîr û hizran pêkan dikî."

Piştî hembêzkirineke dirêj, Xwedayê Bav got,

"Niha guh bide min Kurê min. Ji ber ku tu yê ji bo mirovên vî nifşê û hemû nifşên bîr cezayê bikişînî, ev ceza wê gelekê giran be."



"I think I understand the price."

Jesus stared through the portals of heaven and caught a glimpse of the earth.

"I will also be punished for the sins of those who will be born in the future and do bad things in the future?"


"Yes, that's correct, my Son."

Father God placed His arm around Jesus's shoulder.

"You must also become a human being like them. It is the only way to teach them what they need to learn."

"Yes, Father."

Jesus thought of all the people in need of His Father's help. Then He asked,



"Dibêjim qey ez berdêla vê dizanim."

Îsayî ji dergehên bihuştê dîqek da ser rûyê erdê.

"Ez ê ji bo gunehên kesên ku dê di dahatûyê de çêbin û di dahatûyê de tiştên xirab bikin jî cezayê bikişînim?"


"Erê, ev rast e, Kurê min."

Xwedayê Bav destê xwe danî ser sermilê Îsayî.

"Divê tu jî wekî wan bibî mirovek. Tekane rîya ku tu tiştên pêwîst fêrî wan bikî ev e."

"Erê, Bavo."

Îsa li hemû mirovên ku pêdiviya wan bi alîkariya Bavê wî heye hizirî. Hingê wî pirsî,



"Father, may I ask how I will be punished?"

Father God clutched Jesus's hands and answered,

"My beloved Son, your body will go through a lot of pain."

God pointed to Jesus's hands and feet.

"Your hands and feet will be nailed to a cross."

"I understand. I must be wounded so they can be healed."  
Jesus looked at his hands.

"Bavo, ez dikarim bipirsim ka cezayê ez bikişînim  
çiqas e?"

Xwedayê Bav bi destên Îsayî girtin û bersivand,

"Kurê min ê hez kirî, laşê te wê gelekî êşê bikişîne."

Xwedê dest û piyên Îsayî nîşan dan.

"Dest û piyên te wê bi xaçekê ve bên bizmarkirin."

"Ez fêm dikim. Divê ez birîndar bibim da ku ew baş  
bibin. " Îsayî li destên xwe nihêrî.



"You will die a painful death on a cross."

"I must go through pain, so their pain can be taken away and I must be nailed to a cross, so their sins can be nailed to the cross."

"That's right and three days after your death, I will raise you back to life."


"I will be raised back to life, so they can have a new life."

"Tu yê li ser xaçekê bi mirineke bi êş bimirî."

"Divê ez êşê bikişînim, da ku êşa wan here û divê ez bi xaçekê ve bêm bizmarkirin da ku gunehên wan bi xaçê ve bên bizmarkirin."

"Ev rast e û sê rojan piştî mirina te, ez ê te vegerînim jîyanê."

"Ez ê vegerim jîyanê, da ku wan jîyaneke nû hebe."



JESUS LOVES YOU

Father God lifted His arms triumphantly.

"And you will live forever so they can live eternally as well!  
The cross will then become a symbol of my love and hope for  
all humanity.

The cross will also become a symbol for you—  
Jesus the Messiah, who comes to give, heal, and restore."

Xwedayê Bav bi awayekî serkeftî milên xwe hildan û got,

"Û tu yê heta hetayê bijî da ku ew jî heta hetayê bijîn.  
Paşê xaç wê bibe semboleke hezkirina min û hêviyek ji  
bo hemû mirovahiyê. Xaç dê ji bo te jî bibe sembolek -  
Îsayê Mesîh, yê ku ji bo danê,  
başkirinê û veavakirinê tê."



Readers will get a peek behind the scenes of heaven into Father God's tender heart when he visits with his only son about a plan to redeem the people he loves so much. The children will have a deeper understanding about Jesus's mission to teach, heal and save us, so we can one day live with him forever in heaven.

This Christian picture book is a wonderful resource for families, churches, Sunday schools, homeschoolers, and Christian educators hoping to teach the young generation about Jesus's death on the cross.

The inspirational Christian art hits the heart and beautifully complements the truth the book delivers.

Xwendevan dê li paş sehneyên bihuştê dîqekê bidin dilrehmiya Xwedayê Bav, gava ew li planeke ji bo xelaskirina mirovên pir ji wan hez dike difikire. Zarok dê peywira Îsayî ya ji bo fêrkirin, tedawîkirin û parastina me bi awayê kûrtir fêm bikin, da ku em rojekê bikaribin li gel wî heta hetayê li buhiştê bijîn.

Ev pirtûka wêneyan ya xristiyanîyê ji bo malbatan, dêran, dibistanên yekşemê, dibistanên malê û perwerdekarên xristiyanîyê yên ku dixwazin mirina Îsayî ya li ser xaçê fêrî nifşê ciwan bikin çavkaniyeke bêhempa ye.

Hunera xristiyanîyê ya biîlham, dikeve nava dilan û baweriya wergirên pirtûkê bi awayekî xweşik temam dike.